Pêşgotin

Tevlî hemû çavsoriyên dîrokî, yên li gelê Kurd û li zimanê kudrî bûne, ko hêjî dibistan, pirtûk, kovar û rojnameyên kurdî qedexe ne, tevlî wê jî lê hê zimanê kurdî xwediyê semyanekî zengîn maye. Ev semyan ji dehên hezarên gotinên bav û kalên Kurdan e. Kurd van gotinanan jî li gor rêzimaneke durist bikartênin. Rêziman ji xwe destûra rasaxaftin, rastnivîsandin û rastxwendinê ye. Di warê rêzimên de têgehiştinên kûrtir çêdibin û gavên rast ji bo parastin û pêşxistina zimanê kurdî tên avêtin. Yek ji wan gavan jî pêkanîna kursên hînkirina zimanê kurdî ye, yên ev çend sal in li herêma me li Binxetê berdewamdikin. Ev pirûka di nav destê we de jî di gelek ji wan kursan de tê hînkirin û bûye bingeh di destê mamostayên zimanê kurdî de.

Armanc ji vê pirtûkê ev e:
- hînkirina rêzimana zimanê kurdî
- danîna bingehekê ji bo yekîtiya termînên rêzimanî
- nîşankirina rê li ber, yên dixwazin zanebûnên xwe di warê rêzimana zimanê kurdî de kûrtir û ferehtir bikin.

Ev pirtûk li van kehniyên rêzimanî yên li jêr vegeraye û gelek zanîn ji wan biriye, bi taybetî ji ya pêşî:
1. Gramatîka zimanê kurdî ser zaravê kurmancî bo komên V- VI; Qenatê Kurdo
2. Rêzimana zimanê kurdî; Kamîran Bedirxan
3. Rêzimana zimanê kurdî; Reşîdê Kurd

Eger kêmasiyên vê pirtûkê hebin, bêgoman wê hebin jî, ez hêvîdikim, ko zaneyên zimanê kurdî wê wan rastbikin û babetên tê de nehatine, yan bi kurtî hatine şirovekirin, wê bidin ber lêkolînên ferehtir û kûrtir, da dawî rêzimaneke bi rastî ji her alî ve durist û bikêrhatî were danîn û bibe bingeh ji bona hînbûna rêzimanê zimanê me yê şêrîn û nemir.

Zagrosê Haco

Rimêlan 12.7.1985

Rêziman:
Rêziman destûra rasaxaftin, rastnivîsandin û rastxwendinê ye.

Danas:
- Zimanê mirovî ji **zimanê axaftin** û **zimanê nivîsandinê** çêdibe.
- Zimanê axaftinê bi **dengan** çêdibe.
- Zimanê nivîsandinê bi **tîpan** çêdibe.
- Her tîp dengekî nîşandike, her çend deng (tîp) **bêjeykê** (peyv, gotin, şor) çêdikin û her çend bêje, yên bi bîrsayî bi hev re girêdayî **hevokekê** çêdikin.

Tîpên Alfabêta kurdî
Alfabêta kurdî ji **sih û yek** tîpan biheketiye.

1-**Tîpên çapê**
A.*Tîpên çapê yên girs (girek)*
Tîpên çapê yên girs ev in:

A	**B**	**C**	**Ç**	**D**	**E**	**Ê**	**F**	**G**	**H**	**I**	**Î**	**J**
K	**L**	**M**	**N**	**O**	**P**	**Q**	**R**	**S**	**Ş**	**T**	**U**	**Û**
V	**W**	**X**	**Y**	**Z**								

B.Tîpên çapê yên hûr (hûrek)
Tîpên çapê yên hûr ev in:

a	**b**	**c**	**ç**	**d**	**e**	**ê**	**f**		**g**	**h**	**i**	**î**
j	**k**	**l**	**m**	**n**	**o**	**p**	**q**	**r**	**s**	**ş**	**t**	**u**
û	**v**	**w**	**x**	**y**	**z**							

2 - Tîpên destnivîsandinê
A. *Tîpên destnivîsandinê yên girs*
Tîpên destnivîsandinê yên girs ev in:

A	*B*	*C*	*Ç*	*D*	*E*	*Ê*	*F*	*G*	*H*	*I*	*Î*	*J*
K	*L*	*M*	*N*	*O*	*P*	*Q*	*R*	*S*	*S*	*T*	*U*	*Û*
V	*W*	*X*	*Y*	*Z*								

B. Tîpên destnivîsandinê yên hûr
Tîpên destnivîsandinê yên hûr ev in:

a	*b*	*c*	*ç*	*d*	*e*	*ê*	*f*		*g*	*h*	*i*	*î*
j	*k*	*l*	*m*	*n*	*o*	*p*	*q*	*r*	*s*	*ş*	*t*	*u*
û	*v*	*w*	*x*	*y*	*z*							

Bilêvkirina tîpên kurdî û navên ji bona wan:

Jimar di rêzê de	**Tîp**	**Dengê tîpê**	**Bilêvkirin**
1	A	(a)	Alan
2	B	(bê)	Bêrîvan
3	C	(cê)	Can
4	Ç	(çê)	Çeto
5	D	(dê)	Dara
6	E	(e)	Evîn
7	Ê	(ê)	Êlîxan
8	F	(if)	Findê
9	G	(gê)	Goran
10	H	(ha)	Hêlîn
11	I	(i)	Insan
12	Î	(î)	Îskan
13	J	(jê)	Jala
14	K	(kê)	Kawa
15	L	(il)	Leyla
16	M	(im)	Mêdya
17	N	(in)	Nazê
18	O	(o)	Oldar
19	P	(pê)	Perî
20	Q	(qe)	Qehreman
21	R	(rê)	Rindê
22	S	(is)	Salar
23	Ş	(iş)	Şêrîn
24	T	(tê)	Têlîcan
25	U	(u)	Umîd
26	Û	(û)	Ûsiv
27	V	(vê)	Viyan
28	W	(we)	Welat
29	X	(xê)	Xecê

30	Y	(yê)	Yezdanşêr
31	Z	(zêt)	Zînê

Tîpên cêwî
Tîpên cêwî bi du awayî tên bilêvkirin, carekê nerm û carekê hişk. Tîpên cêwî jî ev in:

Ç K L P R

Hînker

Tîp Awayê nerm Awayê hişk

Tîp	Awayê nerm	Awayê hişk
Ç	çem, çil	çil, çilek, çepel
K	ka,kil,kul	ka?, kurd
L	lêv, ling	lewlew, pelpel
P	pişt, pel	par, pelpel
R	bar, dar	kirin, reng, birin, ker

Tîpên pevdeng
Di zimanê kurdî de yek tîpa pevdeng heye, ev jî ev e: **xw**

Wek:

xweş, xwê, xwîn

Cihderka tîpan
Tîpên ji lêvan dertên

b, f, p, v, w

Tîpên ji serê zimên dertên

d, l, r, s, t, z

Tîpên ji şkefta dêv dertên

C, ç, g, j, k, ş

Tîpên ji qirikê dertên

q, x

Tîpên ji zengelorê dertên

a, e, ê h, i, î, o, , u, û

Tîpên ji bêhvilê dertên

m, n

BÊJE
Bêje gotineke xwedî wate ye ji kîtikê, yan çend kîteyan biheketiye.

Kîte

Kîte ji aliyê dengkirinê ve piçûktirîn parçê bêjeyê ye.

Bêjeyên yekkîte, wek:

av, nav, bav, dar, û, ev, ûhd (**û hin din**).

Bêjeyên dukîte, wek:

ra-bûn, ba-ran, a-va, ba-jar ûhd.

Bêjeyên sêkîte, wek:

ve-xwa-rin, ni-vî-sîn, lev-ke-tin ûhd.

Bêjeyên çarkîte, wek:

ve-mi-ran-din, ni-vî-san-din, ba-jar-va-nî ûhd.

Bêjeyên hevdeng
Du bêjeyên bilêvkirin û nivîsandina wan wek hev bin, lê wateya wan jev cê bin ji wan re bêjeyên hevdeng tê gotin,wek:

pol (polê mirov) pol (polên bi nameyan ve têne kirin)
şîn (rengê şîn) şîn (şîna li ser miriyan)
nav (wek: navê mirov) nav (wek: li nav bajêr)

Bêjeyên hevwate
Bêjeyên wateya wan yek be, lê bilêvkirin û nivîsandina wan jev cê be ji wan re bêjeyên hevwate tê gotin,wek:

welat = nişţîman
şerm = fihêt
zû = bi lez

Bêjeyên dijraber
Bêjeyên wateyên wan dijî hev bin ji wan bêjeyên dijraber tê gotin, wek:

aşîtî<>şer
sar<>germ
dûr<>nêzîk

NÎŞANDEK
Nîşandek alîkariya têgihiştina zimanê nivîsandinê dikin.

, bêhnok
. xal,rawest
; xalbêhnok
: cotxal
? pirsnîşan
! seyrnîşan
() dukevan
(kevanê vekirî
) kevanê girtî
- pîne
"duneynûk

Parçeyên axaftinê koma hemû bêjeyên di axaftin û nivîsandinê de ye. Di zimanê kurdî de heşt komên axaftinê yên sereke hene. Ew kom jî du texlîtin. Texlîtek tê guhertin jê re tê gotin guhêrbar û yê din nayê guhertin jê re tê gotin neguhêrbar.

Parçeyên axaftinê, yên guhêrbar ev in:

nav, rengdêr cînav, jimar û lêker.

Parçeyên axaftinê, yên neguhêrbar ev in:

hoker, daçek û gehandek.

PARÇEYÊN AXAFTINÊ YÊN GUHÊRBAR

Parçeyên axaftinê yên guhêrbar ev in:

1. Nav

Nav parçekî axaftineyî guhêrbar e. Nav du kom in û bi vî awayî tên cêkirin:

a) Navên şênber

b) Navên razber

a) Navên şênber

Navên şênber ew nav in, yên mirov dikare bi pênc sehkerên xwe nasbike. Navên şênber bi vî awayî tên cêkirin:

1. Navê tiştên canbar

2. Navê tiştên necanbar

1. Navê tiştên canbar

Navê tiştên canbar mê ne, nêr in yan dudayendî ne.

a) Navên zayên mê, yên yekjimar

1- Navên jinan

wek:

Narîn, Şêrîn, Gulperî ûhd.

2- Navê mirovan

wek:

jin, bûk, keç, met ûhd.

3- Navê lawiran

wek:

bizin, mih, çêlek ûhd.

*- Ev navên mê di forma hevbendî de çaxê tên tewandin (çivandin) paşdanka hevbendî "**a**"distênin.

Hînker

1- Narîn**a** piçûk, Şêrîn**a** Temo, Gulperiy**a** Reşo.

2- Jin**a** hêja, bûk**a** Simko, keç**a** kurd.

3- Bizin**a** we, mih**a** avis, çêlek**a** stewr.

b) Navên zayend nêr, yên yekjimar

Navên zayend nêr, yên yekjimar di forma hevbendî de çaxê tên çivandin paşdanka hevbendî "**ê**"distênin, û bi vî awayî tên cêkirin:

1- Navê mêran

wek:

Azad, Tîtal, Evdal ûhd. di forma hevbendî de "çivandî"dibin:

Azad**ê** jîr, Tîtal**ê** Şêro, Evdal**ê** Zeynê.

2- Navê mirovan

wek:

Mêr, xort, ûhd. çivandî dibin:

mêr**ê** çê, xort**ê** şoreşvan, bav**ê** Mişo.

3- Navê lawiran

wek:

beran, hesp, nêrî ûhd. di forma hevbendî de "çivandî"dibin:

beran**ê** me, hesp**ê** beze, nêriy**ê** reş.

2- Navê tiştên necanbar

Navê tiştên necanbar jî zayendên mê û nêr distênin.

a) Navên necanbarî mê, yên yekjimar wek navên canbarî mê di forma hevbendî de "çivandî"paşdanka hevbendî "**a**"distênin, wek:

av, baran, berf, beroş ûhd dibin:

av**a** sar, baran**a** hûr, berf**a** çiyê, beroş**a** te.

b) Navên necanbarî nêr, yên yekjimar wek navên canbarî nêr di forma hevbendî de "çivandî"paşdanka hevbendî "**ê**"distênin wek:

kon, nan, agir ûhd dibin:

kon**ê** reş, nan**ê** sêlê, agir**ê** êzingan.

c) navên duzayend

Ev nav carnan wek navên mê û carnan wek navên nêr, ligor xwediyê nav tên bikaranîn.

*- c) **Navên duzayend**

Ev nav carnan wek navên mê û carnan jî navên mêr, li gor xwediyê nav tên bikaranîn.

Hînker:

heval, jar, dijmin, neyar, dost, karker, karmend, mamoste

ûyd.

Çaxê navên duzayend mê bin paştanka hevbendî "**a**"distênin, wek:

heval**a** te, yar**a** Soro, dijmin**a** gel.

Çaxê navên duzayend nêr bin paşdanka hevbendî "**ê**"distênin wek:

heval **ê** hêja, yar **ê** Xecê, harmend **ê** nû.

Navên bernas

Navê bernas navê jin, mêr, cih û welatan e. Her û her bi tîpa girs destpêdike, wek:

Narîn, Zêrîn, Agrî, Kurdistan

ûyd.

Navê bernasî mirovan ji sê navan biheketiye: Navê pêşî, navê bav û navê malbatê, wek:

Azad**ê** Şivan**ê** Temo, Zîn**a** Xiçîk**ê** Lewend.

Navên gelemper

Wek:

mirov, çiya, çem

ûyd.

KM

1. Sê hînkeran li ser navên zayend mê binivîsin!
2. Sê hînkeran li ser navên zayend mêr binivîsin!
3. Sê hînkeran li ser navên duzayend binivîsin!
4. Sê hînkeran li ser navên necanbar binivîsin!

b) **Navên razber**

Navên rezber mirov ne bi her pênc sehkerên xwe nasdike, lêbelê wan bi hişê xwe di sewdanê xwe de nas dike. Ew bi vî awayî tên cêkirin:

1. Navên ramanî, 2. Navên abstraktîv, 3. Navên kirinê.

1. **Navên ramanî**

Zayendê hin ji navên ramanî mê ye, wek:

hêvî, tirs, hêz, sehw, raman ûhd.

Di forma hevbendî de paşdanka hevbendî "**a**"distênin wek:

hêviy**a** welêt, tirs**a** simxuran, hêz**a** çîna karker, sehw**a** reşkê şevê, raman**a** azadiyê.

Zayendiyê, yên din nêr e, wek:

hiş, derd, sewdan ûhd.

Di forma hevbendî de paşdanka hevbendî "**ê**"distênin, wek:

hiş**ê** hijmaryaran, derd**ê** giran, sewdan**ê** mirov

2. **Navên abstraktîv**

Dawiya van navan bi "**atî**", "**tî**", "**ayî**"û yan "**î**"tewa dibe, zayendê wan mê ye û paşdanka hevbendin "**a**"distênin, wek:

heval**tî**, rast**î**, arzan**î**, bilind**ayî**, mezin**ayî** ûhd.

Di forma hevbendî de dibin:

hevalt**iya** gelan, birat**iya** xortan, arzan**iya** şînî ûhd.

3. **Navên kirinê**

Hemû makder wek navên kirinê tên bikaranîn. Zayendê wan mê ye û di forma hevbendî de paşdanka hevbendî "**a**"distênin, wek:

birin, hatin, çûn frotin ûhd.

Di forma hevbendî de dibin:

birin**a** ardî, hatin**a** baranê, çûn**a** çolê.

Navên pirjimar

Hemû nav, yên mê, mêr û duzayend çaxê pirjimar bin di forma hevbendî de paşdanka hevbendî "**ên**"distênin, wek:

heval, keç, hesp, çêlek, hêz, hevalî, hatin, ûhd.

Di forma hevbendî de dibin:

heval**ên** têja, keç**ên** jêhatî, hesp**ên** beze, çêlek**ên** stewr, hêz**ên** nû, hevaltiy**ên** kûr, hatin**ên** rêwiyan.

Navên nependî

Navên nependî, yên yekjimar

1. Navên nependî, yên yekjimar bi alîkariya paşdanka nependiyê "**ek**"çêdibin, wek:

xort, heç, mal, sêr ûhd.

Çaxê ev nav nependî bin, dibin:

xost**ek**, heç**ek**, mal**ek**, şêrek ûhd.

2. Di forma hevbendî de navên zayend mê di dawî de "**e**"şûna "**a**"distênin û navên nêr "**î**"şûna "**ê**"distênin, wek:

keça kurd, xortê kurd ûhd.

Ev nav dibin:

keçek**e** kurd, xortek**î** kurd.

Nasên:

Navên di dawiya wan de tîpeke dengdar be paşdanka nependiyê "**ek**"dikare kurt û bibe "**k**", wek:

pale, wate, bêje, parçe ûhd

dibin:

pale**k**, wate**k**, bêje**k**, parçe**k**.

Nivîsandina van navan wek:

pale**yek**, wate**yek**, bêje**yek**, parçe**yek**

Ev durist e, lê hinekî dirêje.

Navê paşî, yê forma hevbendî

1. Navê nasî paşî, yê mê di forma hevbendî de paşdanka "**ê**"distêne, wek:

mala jin**ê**, deriyê mal**ê**, kirasê Şêrîn**ê**

Eger navê paşî nependî be, hingî paşdanka "**ekê**"distêne wek:

mala jin**ekê**, deriyê mal**ekê**, kirasê Şêrîn**ekê**

2. Navê nasî paşî, yê nêr di forma hevbendî de nayê guhertin, wek:

stûna kon, bavê xort, mala Azad.

Lê eger nav nependî be, hingî paşdanka "ekî"distêne, wek:

stûna kon**ekî**, bavê xort**ek**î, mala Azad**ekî**

Nasîn :

Hin navên nêr hene di forma hevbendî de bi awakî taybetî tên gurtin wek:

dîwar, bajar, ga, xanî ûhd.

Çaxê navê paşî nêr be hingî dibin:

çavê g**ê**, rengê diw**ê**r, dergekê baj**ê**r, deriyê x**ê**nî

Lê eger ev navên taybetî nependî bin hingî di forma rast de tên bikaranîn wek:

rengê dîwar**ekî**, dergekê bajar**ekî**, çavê gay**ekî**, deriyê xanî**kî**.

Navên paşî, yê pirjimar di forma hevbendî de

Navên paşî, yê pirjimar di forma hevbendî de mê, yan nêr bin ew paşdanka "**an**"distênin, wek:

mala jin**an**, deriyê mal**an**, stûna kon**an**, bavê xort**an** ûhd.

Eger navên paşî nependî bin, hingî paşdanka "**nan**"distênin, wek:

mala jin**nan**, deriyê mal**nan**, stûna kon**nan**, bavê xort**nan** ûhd.

Navê kombêj

Navên kombêj ew nav in, yên forma wan yekjimar e, lê wateya wan pirjimar e ji ber ko du endam yan bêhtir di koma xwediyê nav de hene, wek:

kerî, ref, lek, selef, garan ûhd.

KM.

1- Sê hînkeran li ser hemû texlîtên navên razber binvîsin!

2- Sê hînkeran li ser navên nependî yekjimar û pirjimar binivîsin!

3- Sê hînkeran li ser navên paşî di forma hevbendî de binivîsin!

Guhastina nava

Di zimanê kurdî de şeş formên guhastina navan hene, ew jî ev in:

Forma rast, forma bangê, forma tewandî (çivandî), forma bihevre, forma tevayî û forma cîwarî

1. Forma rast

Di forma rast de nav nayê guhertin, wek xwe dimêne. Nav di forma rast de di bersiva pirsan de tê, pirsên wek:

Kî çi dike? Çi çi dike? Çi yan kî di çi rewşê de ye?

Hînker

Kî dibîne? Xort dibîne. Keç dibîne.

Çi ket? Xort ket. Keç ket. Kevir ket.

Kî razaye? Azad razaye. Şêrîn razaye.

Çi şkestiye? Dar şkestiye.

2. Forma bangê

Bi bakirinê mirov dihêle, ko haya, yê tê bakirin ji tiştekî hebe bi nîşandekên bangê, bi bikaranîna nav di forma bangê de û bi alîkariya paşdankên bangê. Paşdankên bangê "**ê**"ko ya navên mê ye, yên yekjimar, "**o**"bo navên nêr e, yên yekjimar û "**no**"bo navên mê û nêr, yên pirjimar e. Nîşandekên bangê ev in:

lê, lêlê, lo, lolo, hey, heylê, heylo, gelî, wa ûhd.

Hînker:

Keç**ê**!Sar**ê**!Şêrîn**ê**!xort**o**!Azad**o**!heval**ê**!keç**no**!xort**no**!yad**ê**!yab**o**!

Serinc: Li pey navan di forma bangê de û di dawiya hevokên bangê de dive seyrnîşan "**!**"were danîn.

3. Forma tewandî (çivandî)

Di forma tewandî de nav di bersiva van pirsan de tê:

Kê kir (kirde mê)? (Tu) çi dikî (têrker mê)? (Ya) kê (ji navê mê re)? Li kûderê? Ji kûderê?

Hînker

Kê dît? Beharê dît.

Tu çi dikî? Ez pirtûkê dibim.

Sola kê ye? Sola min e.

Li kûderê? Li Wanê.

Ji kûderê? Ji Hewlêrê

4. Forma bihevre

Di vê formê de nav di bersiva van pirsan de tê:

Bi kê re? Bi çi re? Ji kê re? Ji çi re? Di kûderê de?

û paşdanka bihevreyî "**re**"distêne, wek:

bi rêwî re, bi çem re, ji heval re, ji malê re, di sêrtê re,

di colê re ûhd.

5. Forma tevayî

Di forma tevayî de nav di bersiva van pirsan de tê:

Di kê ve? Di çi ve? Bi kê ve? Bi çi ve? Di kûderê ve?

û paşdanka tevayî "**ve**"distêne, wek:

Derzî di destê kê ve çû? Di destê Gulêve çû.

Mar bi kê ve da? Bi Reşo ve da.

Win di kûderê ve çûn? Di Dêrikê ve.

6. Forma cîwarî

Di forma cîwarî de nav di bersiva van pirsan de tê:

Di kê de? Di çi de?

û paşdanka cîwarî "**de**"distêne, wek:

Pêşmerge di mala kê de dimêne? Di mala Azad de.

Av di çi de ye? Di golê de.

Guhestina navan li gor zayend

a. Guhestina navên me

Guhestina navên mê ligor nijandina jêrîn dibe:

	Forma guhestinê	**navên yekjimar**		**navên pirjimar**	
		nas	**nependî**	**nas**	**nependî**
1	Forma rast	keç	keçek	keç	keçin
2	Forma bangê	keçê!		keçno!	
3	Forma çivandî	keçê	keçekê	keçan	keçnan
4	Forma bihevre	keçê re	keçekê re	keçan re	keçnan re
5	Forma tevayî	keçê ve	keçekê ve	keçan ve	keçnan ve
6	Forma cîwarî	keçê de	keçekê de	keçan de	keçnan de

b. Guhestina navên nêr

Guhestina navên nêr ligor nijandina jêrîn dibe:

	Forma guhestinê	**navên yekjimar**		**navên pirjimar**	
		nas	**nependî**	**nas**	**nependî**
1	Forma rast	xort bajar	xortek bajarek	xort bajar	xortin bajarin
2	Forma bangê	xorto! Bajaro!		xortno! Bajarno!	
3	Forma çivandî	xort bajêr	xortekî bajarekî	xortan bajaran	xortnan bajarnan
4	Forma bihevre	xort re bajêr re	xortekî re bajarekî re	xortan re bajaran re	xortnan re bajarnan re
5	Forma tevayî	xort ve bajêr ve	xortekî ve bajarekî ve	xortan ve bajaran ve	xortnan ve bajarnan ve
6	Forma cîwarî	xort de bajêr de	xortekî de bajarekî de	xortan de bajaran de	xortnan de bajarnan de

Nasîn 1:

Navên yekjimar û pirjimar di forma rast de jev nayên cêkirin, lê di hevokê de bi alikariya lêker hijmara nav berçav dibe, wek:

Dotmam

Dotmam hat.

Dotmam hatin.

Nasîn 2:

Navên taybetî, wek dîwar, bajar, ga û xanî, ko nêr in, bi tenê dema yekjimar û nas bin taybetmendiya wan di formên tewandî, bihevre, tevayî û cîwarî de tê xuyakirin. Li tabloya jor binere!

Vekît

Gola gundê me

Kamûran Bedirxan

Di nêzîkî gundê me de golek heye. Ev gol gelekî mezin e. Di golê de masiyên mezin peyde dibin. Masîvanên gund ji vê golê masiyan baş digrin û difroşin.

Carna em di vê golê de avcaniyê dikin. Di nav me de melevanên jêhatî hene. Herwekî gol mezin e, gava bayê xurt tê, pêlên bilind lê dirabin.

Di buharê de mirovên gund li ber lêva avê ji xwe re digerin û zarok dileyzin.

Zivistanê ava golê diqerise û qeşayê digire. Zarok li ser qeşayê xwe xîz dikin.

KM

Navên"şev"û"çem"di hemû formên guhestina navan de bikarbênin!

Rengdêr parçekî axaftineyî guhênbar e. Rengdêr reng, kêsim, form, dêm, sîma û karaktera navan diyar dike. Rengdêr di zimanê kurdî de her û her li pey navan tên, wek:

kirasê **sor**, ava **sar**, hevalê **jîr**, xwendevanê **çeleng**, xwendekarê **hêja**, çiyayên **bilind** ûhd.

Berhevaniya rengdêran

Du rengdêr tên bara hev, da diyar bibe, ko navek ji yê din bi karekterekê bêhtir e, ew jî bi alîkariya van paşdankan: "**tir**"û "**tirîn** yan **ya, yê, yên.... tir**".

Sê pêpelûk di berhevaniya rengdêr de hene, bi vî awayî:

pêpelûka pêşî	**pêpelûka diduyan**	**pêpelûka sisiyan**
mezin	mezintir	mezintirîn (ya, yê, yên mezintir)
dirêj	dirêjtir	dirêjtirîn (ya, yê, yên dirêjtir)
dûr	dûrtir	dûrtirîn (ya, yê, yên dûrtir)
kurt	kurttir	kurttirîn (ya, yê, yên kurttir)

Guhestina rengdêran

Guhestina rengdêran ligor nijandina jêrîn dibe:

	Forma guhastinê	**Rengdêr bi navên yekjimar re**		**Rengdêr bi navên pirjimar re**	
		nas	**nependî**	**nas**	**nependî**
1	Forma rast	hevala, hevlê **jîr**	hevaleke, hevlekî **jîr**	hevalên **jîr**	hevalne **jîr**
2	Forma bangê	(hevala, hevlê) **jîrê**, **jîro**!		(hevalên) **jîrno**!	
3	Forma çivandî	hevala, hevlê **jîr**	hevaleke, hevlekî **jîr**	hevalên **jîr**	hevalne **jîr**
4	Forma bihevre	hevala, hevlê **jîr** re	hevaleke, hevlekî **jîr** re	hevalên **jîr** re	hevalne **jîr** re
5	Forma tevayî	hevala, hevlê **jîr** ve	hevaleke, hevlekî **jîr** ve	hevalên **jîr** ve	hevalne **jîr** ve
6	Forma cîwarî	hevala, hevlê **jîr** de	hevaleke, hevlekî **jîr** de	hevalên **jîr** de	hevalne **jîr** de

Çaxê ji bona navekî gelek rengdêr li pey hev werin, hingî dîse rengdêrê dawî li gor nijnandina jorîn tên guhestin, lê rengdêrên nîvekî bi vî bi awayî tên guhestin:

1. Bi navên mê re paşdanka hevbendî "**e**"distênin, wek:

Keça **rinde bedewe** ciwan.

Keçeke **rinde bedewe** ciwan.

Keçên **rinde bedewe** ciwan.

Keçne **rinde bedewe** ciwan.

2. Bi navên mêr re paşdanka hevbendî, "**î**", distênin wek:

Xortê **çelengî jîrî** mêr

Xortekî **çelengî jîrî** mêr

Xortên **çelengî jîrî** mêr

Xortne **çelengî jîrî** mêr

Metelokên kurdî

1. Ne konê bê pez, ne gundê bê rez û ne yê bê ez û ez.

2. Hesp dibeze, siwar pesnê xwe dide.

3. Ga dimre çerm dimêne, mirov dimre nav dimêne.

4. Dilê tirsonek sînga gewr nabîne.

5. Her tişt bi ziravî dişke, mirov bi stûrî.

6. Yê got û kir mêr e, yê negot û kir şêr e û yê got û nekir ji xwe kerê bêkêr e.

7. Ko şev reşbû, tu reştir be!

8. Yê ko ji jina xwe netirse, ne ti mêr e.

9. War ew war e, lê bihar ne ev bihar e.

10. Şêr şêr e, çi jin e çi mêr e.

11. Ew bilûra te lêdixist şikest.

Karê Malê

1. Hersê pêpelûkên berhevaniya van rengdêran "kesk, sor, zer"binivîsin!

2. Van rengan "baş"û "sor"di hemû formên guhestinê de bikarbênin!

3. Hemû rengdêrê di metelokên jor de hatine binivîsin!

Cînav parçekî axatinêyî guhêrbar e, dikeve şûna navan û cihê wan digere. Cînav bi vî awayî tên cêkirin:

1. Cînavên kesînî

a) Cînavên kesînî forma rast

	Yekjimar	**Pirjimar**
kesê pêşî	ez	em
kesê diduyan	tu	win
kesê sisiyan	ev	ew

Hînker

Ez hatim. Em hatn.

Tu hatî. Win hatin

Ew hat. Ew hatin

Azand hat = **Ew** hat

Temo, Rew û Azad hatin = **Ew** hatin

ûhd.

b) Cînavên kesînî forma tewandî

	Yekjimar	**Pirjimar**
kesê pêşî	min	me
kesê diduyan	te	we
kesê sisiyan	wî, wê	wan

Guhastina cînavên kesînî

1	**Forma guhastinê**	**Cînavên yekjimar**	**Cînavên pirjimar**
1	**Forma rast**	ez, tu, ew	me, we, wan
2	**Forma bangê**		
3	**Forma çivandî**	min, te, wî, wê	me, we, wan
4	**Forma bihevre**	(min, te, wî, wê) **re**	(me, we, wan) **re**
5	**Forma tevayî**	(min, te, wî, wê) **ve**	(me, we, wan) **ve**
6	**Forma cîwarî**	(min, te, wî, wê) **de**	(me, we, wan) **de**

Nasîn:

Wek ji tabloya jor tê xuyakirin, cînav di hemû formên tewandî de, wek xwe dimêne.

Hînker

Min bir. Me bir.

Te bir. We bir.

Wê, wî bir. Wan bir.

Azad dît = **Wî** dît

Şêrînê xwend = **Wê** xwend

ûhd.

2. Cînavên arzî

Cînavên arzî ev in:

Cînavên arzî yên yekjimarî mê:

ya min, ya te, ya wî, ya wê

ya me, ya te, ya wan

Cînavên arzî yên yekjimarî nêr:

yê min, yê te, yê wî, yê wê

yê me, yê we, yê wan

Cînavên arzî yên pirjimarî nêr û mê:

yên min, yên te, yên wî, yên wê,

yên me, yên we, yên wan

Guhestin cînavên arzî

Cînavên arzî ji forma rast bi vî awayî têne guhestin:

bi ya min re, bi ya te re, bi ya wî re, bi ya wê re

bi ya me re, bi ya we re, bi ya wan re.

bi ya min ve, bi ya te ve, bi ya wî ve, bi ya wê ve

bi ya me ve, bi ya we ve, bi ya wan ve.

di ya min de, di ya te de, di ya wî de, di ya wê de

di ya me de, di ya we de, di ya wan de.

3. Cînavên nîşankirinê

Cînavên nîşankirinê şûna navên dûr û nêzîk digirin, ew jî ev in:

Ev- ji bo navên nêzîk

Ew- ji bo navên dûr

Hînker

Ev xort e.û **ew** keç in.

Ev keç e.û **ew** xort in.

Guhestina cînavên nîşan kirinê

Çînavên nîşankirinê ligor nîjandin (tablisa, xisteya) jêrîn dibe!

		Cînavên nêzîk			**Cînavên dûr**		
	Forma guhastinê	**yekjimar**		**pirjimar**	**yekjimar**		**pirjimar**
		mê	**nêr**		**mê**	**nêr**	
1	**Forma rast**	ev	ev	ev	ew	ew	ew
2	**Forma bangê**	-	-	-	-	-	-
3	**çivandî**	vê	vî	van	wê	wî	wan
4	**bihevre**	vê re	vî re	van re	wê re	wî re	wan re
5	**tevayî**	vê ve	vî ve	van ve	wê ve	wî ve	wan ve
6	**cîwarî**	vê de	vî de	van de	wê de	wî de	wan de

Nasîn: Carnan paşdanka "**ha**"bi cînavên nîşankirinê ve dibe, wek:

evêha, evaha, evênha

ewêha, ewaha, ewênha.

4. Cînavê li xwe veger

Di zimanê kurdî de bi tenê yek cînavê li xwe veger heye ew jî "**xwe**"ye. "Xwe"cînavekî bêhêl e, dikeve şûna her şeş cînavên kesînî de û diyar dike, ko kirde kirina xwe li xwe divegerêne, wek:

Min xwe dit.

Te xwe şişt.

Wê da birayê xwe dît.

ûhd.

Guhastina cînavê li xwe veger

	Forma guhastinê	**Cînavê li xwe veger**
1	**Forma rast**	xwe
2	**Forma bangê**	-
3	**Forma çivandî**	xwe
4	**Forma bihevre**	xwe re
5	**Forma tevayî**	xwe ve
6	**Forma cîwarî**	xwe de

5. Cînavên hevdûtiyê

Cînavên hevdûtiyê "**hev**"û "**hevdû**"ne. Ew diyar dikin, ko kirin li du kirdeyan divegere, wek:

Me hev dît.

Em hevdû nasdikin.

ûhd.

6. Cînavên girêdanê

Cînavên girêdanê girêdana di nav du navan de diyar dikin, ew jî ev in:

"**ya**"şûna navên zayend mêyî yekjimar digre wek:

Ya di serê govendê de hevala min e.

"**yê**"şûna navên nêrî yekjimar digre, wek:

Yê direj birayê Temo ye.

"**yên**"şûna navên pirjimar herdû zayendan digre, wek:

Yên xwendin, bi ser ketin.

Nasîn: Gelek caran di zimanê me de ev cînav dibin paşdanka hevbendî "a", "ê"û "ên".

Hînker

Keç**a** dileyize, jinbira Simo ye.

Xort**ê** hat, min dît.

Şagirt**ên** piçûk çûn dibistanê.

7. Cinavên pirsê

Cînavên pirsê şûna navan di hevokên pirsê de digrin. Ew jî ev in:

kî, çi, kîjan

kî - ji mirovan re tê bikaranîn.

çi - ji lawir û necarbaran re tê bikaranîn.

kîjan - ji hemû navan re tê bikaranîn.

Guhastina cînavên pirsê

Guhastina cînavên pirsê ligor nijandina jêr dibe:

a) **Guhatina"kî"û"çi"**

	Forma guhastinê	**cînavê**	**pirsê**	**navê**	**li pey çi**
		kî	**çi**	**mê**	**nêr**
1.	**Forma rast**	kî	çi	çi jin	çi xort
2.	**Forma bangê**	-	-	-	-
3.	**Forma tewandî**	kê	çi	çi jinê	çi xortî
4.	**Forma bihevre**	kê re	çi re	çi jinê re	çi xortî re
5.	**Forma tevayî**	kê ve	çi ve	çi jinê ve	çi xortî ve
6.	**Forma cîwanî**	kê de	çi de	çi jinê de	çi xortî de

Hînker

Kî çû bajêr? Kawa çû bajêr.

Kê keştiya gerdûnî dît? Nêrgizê ew dît.

Destik ji çi re ye? Ew ji derî re ye.

b) Guhastina kîjan

	Forma guhastinê	**yekjimar**		**pirjimar**
		mê	**nêr**	
1.	**Forma rast**	kîjan	kîjan	kîjan
2.	**Forma bangê**	-	-	-
3.	**Forma tewandî**	kîjanê	kîjanî	kîjanan
4.	**Forma bihevre**	kîjanê re	kîjanî re	kîjanan re
5.	**Forma tevayî**	kîjanê ve	kîjanî ve	kîjanan ve
6.	**Forma cîwanî**	kîjanê de	kîjanî de	kîjanan de

Nasîn:

Navên li pey "kîjan"li gor zayend û forma tê de tê guhastin. Cînavê "**kîjan**"nayê guhertin.

Hînker

Kîjan heval hat?

Kîjan keçê bir?

Te ji kîjan xortî re got?

Ji kîjan kesan re dibêjin xwendevan?

Nîşan bi kîjan leşkeran ve kirin?

KM.

Deh hevokan binuivîsin, yên ko di wan de cînavên buhurtî hebin.

8. Cînavên nebinavkirî

Cînavên nebinavkirî şûna navan digrin, lê bi awakî neron pêşkeş dikin. Ew jî sê kom in:

a) heçî, hîç, ti ûhd.

Ev cînav nayên tewandin, wek:

Heçî zû hat rûnişt, lê yên dereng hatin li ser piyan man.

Ti rê bi vî çiyayî nakevin.

b) yek, heryek, kes, herkes, tişt, hertişt ûhd.

Ev cînav tên tewandin, wek:

Yekî got. Ji herkesî re bêjin!

c) hemû (hemî), hin, hinek, çendek ûhd.

Ev cînav pirjimar in û tên tewandin, wek:

Hemiyan got, em azadiyê dixwazin.

Hin hatin.

Çendek çûn.

Nasîn 1:

Di zimanê kurdî de daçek û cînavên kesînî "**wê**"û "**wî**"dighin hev û bo sivkaniya nivîsandinê û axaftinê bi vî awayî bi kar tên:

li wê, **li w**î dibin **lê**

li wê, **li wî** dibin **pê**

di wê, **di wî** dibin **tê**

ji wê, **ji wî** dibin **jê**

Hînker:

Min **lê** nerî.

Belavok **pê** re ne.

Rêwî **tê** de ne.

Min **jê** re got.

Nasîn 2:

Cînavên kesînî "**wê**"û "**wî**"carnan bi kurtî tên bikaranîn û dibin "**ê**", wek:

Min day**ê**. Di şûna: Min da **wê** (**wî**).

Te gotiy**ê**. Di şûna: Te got **wê** (**wî**).

Jimar parçekî axaftinêyî guhêrbar e bi vî awayî jev tê cêkirin:

a) Jimarên bingehîn

Jimarên bingehîn bersiva van pirsan didin: "**çend**?"û "**çiqas**?".

1. Jimarên dehên pêşî

1- yek 6- şeş

2- didu 7- heft

3- sisê 8- heşt

4- çar 9- neh

5- pênc 10- deh

2. Jimarên dehên diduyan

11- yazdeh 16- şazdeh

12- diwazdeh 17- hivdeh

13- sêzdeh 18- hijdeh

14- çardeh 19- nozdeh

15- pazdeh 20- bîst

Hînker

Navê **çaran** şaş hatiye nivîsandin.

Hespê me cihê **pazdehan** di cirîdê de girt.

Di salên **bîstan** de Kurdistan çar parçe kirin.

3. Jimarên dehta

10- deh 60- şêst

20- bîst 70- heftê

30- sih 80- heştê

40- çil 90- not

50- pêncih 100- sed

Hînker:

Deh şagirt hatin.	**Deh** şagirt dixwênin.	Ez ji **dehan** dipirsim.
Bîst şagirt hatin.	**Bîst** şagirt dixwênin.	Ez **bîstan** dipirsim.
Sih şagirt hatin.	**Sih** şagirt dixwênin.	Ez ji **sihî** dipirsim.
Çil şagirt hatin.	**Çil** şagirt dixwênin.	Ez ji **çilî** dipirsim.
Pêncih şagirt hatin.	**Pêncih** şagirt dixwênin.	Ez ji **pêncihî** dipirsim.
Şêst şagirt hatin.	**Şêst** şagirt dixwênin.	Ez ji **şêstî** dipirsim.
Heftê şagirt hatin.	**Heftê** şagirt dixwênin.	Ez ji **heftêyî** dipirsim.
Heştê şagirt hatin.	**Heştê** şagirt dixwênin.	Ez ji **heştêyî** dipirsim.
Not şagirt hatin.	**Not** şagirt dixwênin.	Ez ji **notî** dipirsim.
Sed şagirt hatin.	**Sed** şagirt dixwênin.	Ez ji **sedî** dipirsim.

Nasîn:

Dema jimarên sih, **çil, pêncih, şêst, heftê, heştê, not** û **sed di** hevokê de têrker bin, hingî wek yekjimar tên bikaranîn.

4. Jimarên sedta

100- sed 600- şeşsed

200- dused 700- heftsed

300- sêsed 800- heştsed

400- çarsed 900- nehsed

500- pêncsed 1000- hezar

Hînker:

Di vê dibistanê cihê hezarî heye. (yek hezar)

Di vê dibistanê cihê hezararan heye. (gelek hezar)

Nasîn:

Dema jimarên li jor di hevokê de di forma tewandî de bin, hingî ew wek yekjimarên nêr tên bikaranîn.

5. Jimarên mezin

1 000 000 = milyon = hezar hezar

1 000 000 000 = milyard = hezar milyon

Di zimanê kurdî de xwendina jimaran ji xana mezin destpêdike ber bi ya piçûk ve, wek:

9524 = neh hezar û pêncsed û bîst û çar

9 - xana hezaran

5 - xana sedan

2 - xana dehan

4 - xana yekan

Nasîn:

Milyon û milyard nêr in.

b) Jimarên carkirî

Jimarên carkirî bi vî awayî ne:

1- carek, ducar, sêcar,... ûhd.

2- yek yek (yeko yeko, yeke yeke), dido dido, sisê sisê, çare çar,... ûhd.

3- yekta, duta, sêta,... ûhd.

c) Jimarên kombêj

Jimarên kombêj ev in:

..., şeşek, heftek, heştek,...

ûyd.

ç) Jimarên bi paşdanka "anî"

Ew jî ev in:

yeka**nî**, duy**anî**, sêy**anî**, çar**anî**,...

ûyd.

d) Jimara rêzda

Jimarên rêzda bersiva van pirsan didin "**kîjan**"û "ya, yê, yên çenda".

Du formên jimarên rêzda hene:

1. Pêşî (ya, yê, yên, yekê), ya diduyan, ya sisiyan,...

ûyd.

2. Yekemîn, diwemîn, sêyemîn, çaremîn...

ûyd.

e) **Jimarên şikeste**

Jimarên porçedar ev in:

1. **Jimarên şikesteyî bingehî**

1/2- nîv, 1/3- sêyek (sisê ji yekê) 1/4- çaryek,...

2/3 - sêdu (sisê ji diduyan), 5/4 - (çar ji pêncan)

ûyd.

2. **Jimarên şikesteyî dehyekî**

0.1 - sifir xal yek

0.02 - sifir xal sifir didu

5.471 - pênc xal çar heft yek

ûyd.

ê) **Jimarên tewaw**

Jimarên tewaw ev in:

0, 1, 2, 3,..... ∞ (ta nemayê),

-1 (kêm yek) -2 (kêm didu), -3 (kêm sisê)… -∞ (ta mînus nemayê),

ûyd.

Ferhengoka jimaran

jimarên cot: 2, 4, 6,..., -246...

jimarên dabeşbar:

2, 4, 6, 9, 10, 12, 14, 15, 16,...

jimarên xwebeş:

1, 2, 3, 5, 7, 11, 13, 17, 19, 23, 29,...

+ nîşana komkirinê

- nîşana kêmkirinê

x nîşana carkirinê

/ nîşana dabeşkirinê

x^2 x çarçik

x^3 x. kabik

Ra

rayê ducar (çarçikî) ji x

rayê sêcar (kabikî) ji x

encamê encamê kombikirinê

rayê rasteqîne

rayê leylanî

Numroyên romanî

I	1	XI	11	XXI	21	XL	40
II	2	XII	12	XXII	22	L	50
III	3	XIII	13	XXIII	23	LX	60
IV	4	XIV	14	XXIV	24	LXX	70
V	5	XV	15	XXV	25	LXXX	80
VI	6	XVI	16	XVI	26	XC	90
VII	7	XVII	17	XVII	27	C	100
VIII	8	XVIII	18	XVII	28	CC	200
IX	9	XIX	19	XXIX	29	D	500
X	10	XX	20	XXX	30	M	1000

KM

Deh hevokan binivîsin ko tê de cînavên nebinavkirî hebin!

Lêker parçekî avaftinêyî guhêrbar e, pê kar, kirin, bûn û heyîna mirov, lawir û tiştan diyar dibe. Bi veguhastina lêkeran sê tişt tên berçavkirin, ew jî: **kes, jimar** û **çax**.

Kirde:

Kirde di hevokê de bêjeyeke, ko ew (subjekt) bi karekî dirabe dike. Kirde dikare mirovek be, lawirek be, û yan jî tiştek be.

Têker:

Têker di hevokê de bejeyeke, ko tiştek tê serê wî, wê, wan (objekt). Têrker dikare mirovek be, lawirek be, û yan jî tiştek be.

Hînker

Kirde	**Têrker**	**Lêker**
Azad	pirtûk	xwend
Şivan	pez	diçêre
Ewê	gulan	bifroşe

1. **Veguhestina lêkerê heyînê**

Du formên lêkerê "heyînê" hene :

1. **Heyîn di dema niha de**

2. **Hebûn di demên bihûrtî de û dema werê de**.

Dema niha

Di dema niha de çaxê lêkerê **heyînê** tê veguhestin, hingî **nîşana kesan** "**me**", "**yî**", "**ye**" û "**ne**" li rayê **lêker** "**he**"zêde dibin, bi vî awayî:

Forma erêtî

	yekjimar	**pirjimar**
kesê pêşî	ez heme (he+me)	em hene (he+ne)
kesê diduyan	tu heyî (he+yî)	win hene (he+ne)
kesê sisyan	ew heye (he+ye)	ew hene (he+ne)

Forma neyînî

Forma neyînî bi sê awayî dibe:

a)

	yekjimar	**pirjimar**
kesê pêşî	ez tineme	em tinene
kesê diduyan	tu tineyî	win tinene
kesê sisyan	ew tineye	ew tinene

b)

	yekjimar	**pirjimar**
kesê pêşî	ez ne heme	em ne hene
kesê diduyan	tu ne heyî	win ne hene
kesê sisyan	ew ne heye	ew ne hene

c)

	yekjimar	**pirjimar**
kesê pêşî	ez nînim (nîn+im)	em nînin (nîn+in)
kesê diduyan	tu nînî (nîn+î)	win nînin (nîn+in)
kesê sisyan	ew nîne (nîn+e)	ew nînin (nîn+in)

Çaxê nîşanên kesan "**me**","**yî**","**ye**" û "**ne**", yên ko parçekî lêkerê heyînê ne, li pey navan tên hingî ramana heyînê diyardikin.

a) Navên dawiya wan tîpeke dengdar be, hingî nîşanên kesan"**me**, **yî**, **ye**, **ne**"li pey wan tên, wek:

Ez pale me. Em pale ne.

Tu pale yî. Win pale ne.

Ew pale ye. Ew pale ne.

b) Navên dawiya wan tîpeke bêdeng be, hingî nîşanên kesan"**im**, **î**, **e**, **in**"li pey wan tên, wek:

Ez karmend im. Em karmend in.

Tu karmend î. Win karmendin.

Ew karmend e. Ew karmendin.

Nasîn:

Nîşana kesan "**ne**, **in**", ya lêkerê"**heyînê**"bi hersê kesên pirjimar re nayê guhertin. Bo vê yekê û bo jevcêkirinê dive cînavên kesînî bêne bikaranîn, wek:

Em şagirt in.

Win şagirt in.

Em şagirt in.

2. **Veguhastina lêkerê "hebûnê"**

Dema bihûrtî

Forma erêtî

	yekjimar	**pirjimar**
kesê pêşî	ez hebûm (he+bûm)	em hebûn (he+bûn)
kesê diduyan	tu hebûyî (he+bûyî)	win hebûn (he+bûn)
kesê sisyan	ew hebû (he+bû)	ew hebûn (he+bûn)

Forma neyînî

	yekjimar	**pirjimar**
kesê pêşî	ez (ti) nebûm	em (ti) nebûn
kesê diduyan	tu (ti) nebûyî	win (ti) nebûn
kesê sisyan	ew (ti) nebû	ew (ti) nebûn

Dema berê (mand)

Forma erêtî

	yekjimar	**pirjimar**
kesê pêşî	ezê hebim (he+bim)	emê hebin (he+bin)
kesê diduyan	tê hebî (he+bî)	winê hebin (he+bin)
kesê sisyan	ewê hebe (he+be)	ewê hebin (he+bin)

Forma neyînî

	yekjimar	**pirjimar**
kesê pêşî	ezê (ti) nebim	emê (ti) nebin
kesê diduyan	tê (ti) nebî	winê (ti) nebin
kesê sisyan	ewê (ti) nebe	ewê (ti) nebin

Vekît

Di gundê me

Kamûran Bedirxan

Rojhilat e. Ezman hêdî hêdî bi rengên sor û zer dikene. Şivan bi pez û seyê xwe ve ji gund derdikeve. Gavan jî dewêr dide hev û ber bi çolê ve diçe. Deriyên xaniyan vedibin û gundî diçin zeviyên xwe. Zaro, ji ber ko dibistan girtî ye ji xwe re digerin, derdikevin çolê, bê diguhêrin. Jin û keçên gund dest bi karê mala xwe dikin. Hin ji kaniyê avê tênin, hin nanê xwe dipêjin û hinek jî beravê dikin. Hinek ji wan jî teşiyê dirêsin, tevn û mafûran çêdikin. Di gund de her kes bi dilovanî dixebite. Gundî hemû tev ji hev dikin, ew dizanin, ko hemû birayên hev in û wek mirovên hov berberiya hevdî nakin.

KM

Deh hevokan binivîsin, yên di wan de lêkerê ”heyînê” hebin!

Metelok

1. Yê ko dest dike dê û bav nakin.

2. Dijminê bêv nabe destê lêw.

3. Her kezîzerek simbêlsorek li pey e.

4. Heçî jinekê bêne, dive tûrek pereyê wî, yan barek derewên wî hebe.

5. Sê gidî hene li dinê, yê li hevrazan vedixwe qelûnê, yê mala xwe datîne rex mala bavê jinê û yê bi rê ve diçe bi tenê.

6. Mirovekî tirsonek her car dimire, yê mêr carekê.

7. Mirin ne hêjayî şînê ye.

8. Mirin mirin e, xirxir çi ye?

Makder

Makder ew bêje ne, yên ko navê kirinekê yan jî navê bûnekê ne, wek:

birin, bûn, dan, kirin, kirîn û y d.

Hînker

kirina cejnê, **birina** pirtûkê, **dana** xwedê, **kirîna** gulan, **bûna** komarê.

Nasîn1:

Ji hînkerên buhûrtî tê naskirin, ko çaxê makder nav e her û her zayend mê ye û paşdanka hevbendî "**a**"distêne.

Nasîn2:

Eger dawiya rayê makder bêdeng be ew bi paşdanka "**in**" tewadibe be û bi "**n**" eger dengdar be, wek:

Makder	**Ra**	**Paşdank**
kirin	kir	**in**
birin	bir	**in**
dan	da	**n**
bûn	bû	**n**

Pêşdankên afirandina deman

Di zimanê kurdî de sê pêşdankên afirandina deman hene, ew jî ev in:

di, **bi**, **ê**

1. **Pêşdanka ”di”**

Pêşdanka”**di**” bo afirandina dema niha û dema berêyî dirêj tê bikaranîn.

a) **Bona dema niha**

wek:

Ez **di**nivîsim.

Tu **di**çî.

Ew **di**de.

Em **di**bin.

Win **di**leyizin.

Ew **t**ajon ”**di**ajon“.

Ez **di**zanim.

b) **Bona dema berêyî dirêj**

Wek:

Min **di**got.

Şêrîn **di**çû.

Te **di**bihîst.

Wê **di**bir.

Azad **di**kirî.

2. Pêşdanka”bi”û”yê”

Pêşdanka ”**bi**” û ”**ê**” bo afirandina dema werê û bi lêkerên hekeyî re tên bikaranîn

a) Bona dema werê

Wek:

Ez**ê bi**bihîzim.

T**ê** (tuyê) **bi**xwênin.

Ew**ê** **b**ajo (**bi**ajo).

Em**ê** **bi**çin.

Bêrîvan**ê** **bi**doşe.

Ew**ê** **bi**leyizin.

b) Bi lêkerên hekêrîyê

Wek:

Min**ê** **bi**bira.

Tey**ê** **bi**xwenda.

Ew**ê** **bi**leyista.

Ra

Afirandina rayên deman

Ra ji makderan tên standin. Di zimanê kurdî de du rayên deman hene, yek bo demên bihûrtî ye û yê bo dema niha, dema werê û dema fermanî ye.

a) **Rayên demên bihûrtî**

Em rayên demên bihûrtî ji makderê bi avêtina paşdanka "**in**, **n**" distênin, ew jî bi vî awayî:

Makder	**Rayê dema bihûrtî**
kir**in**	kir
bir**in**	bir
hat**in**	hat
stand**in**	stand
ket**in**	ket
got**in**	got
çû**n**	çû

Nasîn:

Rayê demên bihûrtî wek veguhastina lêker e bi kesê yekjimarî sisya re di dema berê bihûrtîde. Wek nimûne:

Lêker	**Rayê dema bihûrtî**
Wê, wî **kir**	kir
Wê, wî **bir**	bir
Ew **hat**	hat
Wê, wî **stand**	stand
Ew **ket**	ket
Wê, wî **got**	got
Ew **çû**	çû

Vekît

Bîranînekî

Rojen Barnas

Ev koma stêrka ye li ezman

Ev koma srêrka ye bi keser diçrisin

Û kovanî dirêse bi dilovan

Li kujekî Leyla

Li kujekî Mecnûn

Ev keriyê pezan e, li serê Sîpan

Ev keriyê pezkkoviyan, dil tim bi tirs e

Bîranîneke wan heye ko suhtî hinavan

Çavên wan Xeco

Stro ji Siyamenê dilxwîn

Ev refa kevoka ye li dorên bircan

Ev refa ha, her şev li Birca Belek dilîse

Ji kezebê stranekê distrin,

Straneke ji can

Serpêhatiya Mem û Zînê Radigehênin gerdûn.

Afirandina rayê dema niha

Ji bona afirandina rayê dema niha rêzaneke pêkhatî nîne. Ji her komek lêkeran re bi awakî taybetî rayê dema niha tê afirandin. Lê çaxê em ji lêkerê dema niha pêşdanka "**di**" û nîşana kesan "**im, î, e, in**" bavêjin, wî çaxî rayê dema niha bidest me dikeve, ew jî bi vî awayî:

Lêker di dema niha de	**Cêkirina pêşdanka "di" û nîşana kesan**	**rayê dema niha**
Ez dinivîsim	di+nivîs+im	**nivîs**
Tu dinivîsî	di+nivîs+î	**nivîs**
Ew dinivîse	di+nivîs+e	**nivîs**
Em dinivîsin	di+nivîs+in	**nivîs**
Win dinivîsin	di+nivîs+in	**nivîs**
Ew dinivîsin	di+nivîs+in	**nivîs**

Bi vê tê diyarkirin ko ”**nivîs**” rayê dema niha ye û ji makder”**nivîsandin**“ hatiye.

Komên lêkeran

Di zimanê kurdî de sê komên lêkeran hene, ew jî ev in:

1. Lêkerên hîmî,
2. Lêkerên afirandî,
3. Lêkerên cemkirî.

1. Lêkerên hîmî

Lêkerên hînî ew lêker in, yên ko rayê wan di zimanê kurdî de wek navan

nayên bikaranîn. Rayên wan bi tenê ji bona çêkirina demên bihûrtî û niha tên bikaranîn. Rayê dema bihûrtî û niha ne bi yek awayî dibe.

Hînker 1

Makder	**Rayê dema bihûrtî**	**Rayê dema niha**
guhastin	guhast	guhêz
xwestin	xwest	xwaz
leyistin	leyist	leyiz
pêtin	pêt	pêj
avêtin	avêt	avêj
kuştin	kuşt	kuj
gotin	got	bêj
dîtin	dît	bîn
ketin	ket	kev
man	Man	mên
anîn	anî	ên

Nasîn:

Çaxê di hin dawiya lêkerên hîmî de, tîpa”**t**” hebe, carnan hin wê tavêjin, ev yek jî nedurist e, wek:

got- go

dît- dî

cût- cû

dirût- dirû

Hînker 2

Makder	Rayê dema bihûrtî	Rayê dema niha
dan	da	d
Bûn	bû	b
kirin	kir	k
birin	bir	b
Çûn	çû	ç
xistin	Xist	x

Ji hînkerên diduyan tê diyarkirin, ko rayê dema niha ji tîpa pêşî, ya rayê dema bihûrtî çêdibe.

Hînker 3

Makder	Rayê dema bihûrtî	Rayê dema niha
dirûtin	dirût	dirû
ajotin	ajot	ajo
cûtin	cût	cû
girtin	girt	gir
kolan	kola	kol
hêrtin	hêrt	hêr

Ji hînkerên sisiyan tê berçavkirin, ko rayê dema niha ji rayê dema bihûrtî tê afirandin bi avêtina tîpa dawî.

Vekît

Mêrê min di şer de ye

Şev e, şeveke tarî. Bayekî sar û xurt tê, berf û baran bi hev re dikevin. Di nav zinar û rêlan de, didaristanan de ba difîkîne, dengê wî kûvî ye. Temo tivinga xwe dide hevalên xwe, bê Zîna xwe nikare. Dev ji hevalan berdide û rêya xaniyê xwe digire.

Ezman bi stêran tijî ye, berf û baran sekinîne, ba daniye, bi tenê ji dûr ve ewrekî reş dilive.

Dengê mêrê wê tê:

- Zînê veke, ez im mêrê te Temo! Zînê derî vedike, li Temo dinere, bi çavekî tal û sar lê mêze dike û jê re dibêje:

- Mêrê min Temo, bi hevalên xwe re di şer de ye. Û derî digire.

KM

Rayê dema bihûrtî û niha, ya van makderan binivîsin: Xwendin, rabûn, hiştin.

Di zimanê kurdî de du texlîtên lêkeran hene, ew jî ev in:

a) Lêkerên saltgîr
b) Lêkerên derhingêv

Lêkerên derhingêv û yên saltgîr bi bandor, raman û veguhastina xwe jev cê ne.

a) Lêkerên saltgîr
Lêkerên saltgîr ew lêker in, yên bûnekê yan qewmandinekê nîşan dikin. Dema di hevokê de bi tenê lêker û kirde (subjekt) hebin, hevok durist dibe, wek:

Ez diçim.
Ga mir.
Temo bû.
Ew punjî.
Şoreş wê rabe.
Baran hat.

b) Lêkerên derhingêv
Lêkerên derhingêv ew lêker in, yên di hevokê de têrker dixwazin, wek:

Tu namê dinivîsî.
Te belavok bir.
Wê vekît nivîsan.
Şivan helbest xwend.

Dem û afirandina lêkeran
Di zimanê kurdî de heşt demên lêkeran hene, ew jî ev in:

1. **Dema niha.(mand)**
2. **Dema werê**
3. **Forma fermanî**
4. **Dema berê bihûrtî**
5. **Dema berêyî ji zû de bihûrtî**
6. **Dema berêyî dirêj**
7. **Dema berê- niha**
8. **Demên hekeyî**

Veguhastina lêkerên hîmî yên saltgîr
Wek hînker emê lêkerê "**ketin**" bistênin, yê ko xwediyê rayê dema bihûrtî "**ket**" e û rayê dema niha"**kev**" e.

1. Dema niha
Di dema niha de "**di**" bi pêşiya rayê dema niha ve dibe û nîşana kesan bi dawiyê ve dibe, ew jî bi vî rengî.

Forma erêtî

	yekjimar	**pirjimar**
kesê pêşî	ez **di**kev**im**	em **di**kev**in**
kesê diduyan	tu **di**kevî	win **di**kev**in**
kesê sisyan	ew **di**keve	ew **di**kev**in**

Forma neyînî
Di forma neyînî de "**an**" şûna "**di**" digre, ew jî bi vî awayî:

	yekjimar	**pirjimar**
kesê pêşî	ez **na**kev**im**	em **na**kev**in**
kesê diduyan	tu **na**kevî	win **na**kev**in**
kesê sisyan ew	ew **na**keve	ew **na**kev**in**

2. Dema werê
Dema werê bi vî awayî çêdibe:
Alavê dema werê "**ê** yan jî **dê** (**wê**)" li pey kirde tê, "**bi**" bi rayê dema niha ve dibe û nîşana kesan bi dawiya wî ve dibe, bi vî awayî:

Forma erêtî

	yekjimar	**pirjimar**
kesê pêşî	ez**ê bi**kev**im**	em**ê bi**kev**in**
kesê diduyan	t**ê** (tuyê) **bi**kevî	win**ê bi**kev**in**
kesê sisyan	ew**ê bi**keve	ew**ê bi**kev**in**

Forma neyînî
Du formên neyînî hene, ew jî ev in:

a) **Forma pêşî**

	yekjimar	**pirjimar**
kesê pêşî	ez**ê ne**kev**im**	em**ê ne**kev**in**
kesê diduyan	t**ê ne**kevî	winê **ne**kev**in**
kesê sisyan ew	ewê **ne**keve	ewê **ne**kev**in**

Di vê forma neyînî de û "**ne**" dikeve şûna "**bi**" û bi rayê dema niha ve nadibe.

b) **Forma diduyan**

	yekjimar	**pirjimar**
kesê pêşî	ez **na**kev**im**	Em **na**kev**in**
kesê diduyan	tu **na**kevî	Win **na**kev**in**
kesê sisyan ew	ew **na**keve	Ew **na**kev**in**

Di vê forma neyînî de alavê dema werê "**ê** yan jî **dê** (**wê**)" li pey kirde nayê, "**na**" dikeve şûna "**bi**" û bi rayê dema niha ve dibe.

3. Forma fermanî
Forma fermanî bi vî awayî çêdibe:
Di forma erêtî de "**bi**" bi pêşiya rayê dema niha ve dibe, lê di forma neyînî de "**ne**" pê ve dibe. Bi kesê diduyan, yê yekjimar re "**e**" û bi kesê diduyan, yê pirjimar re "**in**" bi dawiya lêker ve dibe, ew jî bi vî awayî

Forma eretî

kesê diduyan yê yekjimar:

(tu) bikev**e**!
bib**e**!
bik**e!**

kesê diduyan yê yekjimar:

(win) bikev**in**!
bib**in**!
bik**in**!

Forma neyînî

kesê diduyan yê yekjimar:

(tu) **ne**kev**e**!
neb**e**!
nek**e!**

kesê diduyan yê yekjimar:

(win) **ne**kev**in**!
neb**in**!
nek**in**!

4. Dema berê buhûrtî
Dema berê buhurtî bi vî awayî çêdibe:
Nîşana kesan li dawiya rayê dema buhûrtî ve dibe:

Forma eretî

	yekjimar	**pirjimar**
kesê pêşî	ez ket**im**	em ket**in**
kesê diduyan	tu ketî	win ket**in**
kesê sisyan ew	ew ket	ew ket**in**

Forma neyînî

	yekjimar	**pirjimar**

kesê pêşî	ez **ne**ket**im**	em **ne**ket**in**
kesê diduyan	tu **ne**ketî	win **ne**ket**in**
kesê sisyan ew	ew **ne**ket	ew **ne**ket**in**

5. Dema berêyî ji zû de buhurtî
Dema berêyî ji zû de buhurtî bi wî awayî çêdibe:
Lêkerê "**bûn**" di dema berê de bi rayê dema bêrê ve, yê lêkerê hîmî ve dibe û li gor kesan tê veguhastin. Tîpa "**i**" dikeve nav lêkerê ko dawiya rayê dema wîyî buhûrtî tîpeke bêdeng be û nav lêkerê "**bûnê** ".

Forma erêtî

	yekjimar	**pirjimar**
kesê pêşî	ez ket**ibûm**	em ket**ibûn**
kesê diduyan	tu ket**ibûyî**	win ket**ibûn**
kesê sisyan ew	ew ket**ibû**	ew ket**ibûn**

Forma neyînî

	yekjimar	**pirjimar**
kesê pêşî	ez **ne**ket**ibûm**	em **ne**ket**ibûn**
kesê diduyan	tu **ne**ket**ibûyî**	win **ne**ket**ibûn**
kesê sisyan ew	ew **ne**ket**ibû**	ew **ne**ket**ibûn**

Nasên:
Çaxê "î" bi dawiya rayê dema buhûrtî ve dibe, hingî navê kirdeyî tê çêkirin, wek:

bir - birî
da - dayî
got - gotî
hat - hatî
ket – ketî
ma - mayî
mir - mirî
ûym (**û yên mayî**).

Hînker

Temo ketibû.	Temo ketî bû.
Reşo miribû.	Reşo mirî bû.
Ew mabû.	Ew mayî bû.

Hevokên pêşî di dema berêyî ji zû de bulûrtî de ne.

6. Dema berêyî dirêj
Dema berêyî dirêj bi vî awayî çêdibê:
Nîşana dema niha "**di**" li pêşiya rayê dema buhûrtî ve dibe û nîşana kasan bi dawiya wî ve dibe.

Forma eretî

	yekjimar	**pirjimar**
kesê pêşî	ez **di**ket**im**	em **di**ket**in**
kesê diduyan	tu **di**ketî	win **di**ket**in**
kesê sisyan ew	ew **di**ket	ew **di**ket**in**

Forma neyînî

	yekjimar	pirjimar
kesê pêşî	ez **nedi**ket**im**	em **nedi**ket**in**
kesê diduyan	tu **nedi**ketî	win **nedi**ket**in**
kesê sisyan ew	Ew **nedi**ket	ew **nedi**ket**in**

7. Dema berê- niha

Dema berê- niha bi vî awayî çêdibe:

Nîşana kesan "**me, yî, ye, ne**" bi dawiya rayê dema buhûrtî ve dibe, lê eger dawî rayê dema buhûrtî bêdeng be hingî "i" dikeve nav wan de.

Forma eretî

	yekjimar	pirjimar
kesê pêşî	ez ket**ime**	em ket**ine**
kesê diduyan	tu ket**iyî**	win ket**ine**
kesê sisyan ew	ew ket**iye**	ew ket**ine**

Forma neyînî

	yekjimar	pirjimar
kesê pêşî	ez **ne**ket**ime**	em **ne**ket**ine**
kesê diduyan	tu **ne**ket**iyî**	win **ne**ket**ine**
kesê sisyan ew	ew **ne**ket**iye**	ew **ne**ket**ine**

8. Demên hekeyî

Çar formên demên hekeyî hene, ew jî bi vî awayî ne:

Dema nihayî hekeyî

Forma erêtî

	yekjimar	pirjimar
kesê pêşî	ez **bi**kev**im**	em **bi**kev**in**
kesê diduyan	tu **bi**kevî	win **bi**kev**in**
kesê sisyan	ew **bi**kev**e**	ew **bi**kev**in**

Forma neyînî

	yekjimar	pirjimar
kesê pêşî	ez **ne**kev**im**	em **ne**kev**in**
kesê diduyan	tu **ne**kevî	win **ne**kev**in**
kesê sisyan ew	ew **ne**kev**e**	ew **ne**kev**in**

1. Dema berê forma A

Forma eretî

	yekjimar	pirjimar
kesê pêşî	ez biket**ama**	em ket**ana**
kesê diduyan	tu ket**ayî**	win ket**ana**
kesê sisyan ew	ew ket**a**	ew ket**ana**

Forma neyînî

	yekjimar	**pirjimar**
kesê pêşî	ez **ne**ket**ama**	em **ne**ket**ana**
kesê diduyan	tu **ne**ket**ayî**	win **ne**ket**ana**
kesê sisyan ew	ew **ne**ket**a**	ew **ne**ket**ana**

3. Dema berê forma B

Forma eretî

	yekjimar	**pirjimar**
kesê pêşî	ez**ê** biket**ama**	em**ê** ket**ana**
kesê diduyan	t**ê (tuyê)** ket**ayî**	win**ê** ket**ana**
kesê sisyan ew	ew**ê** ket**a**	ew**ê** ket**ana**

Forma neyînî

	yekjimar	**pirjimar**
kesê pêşî	ez**ê ne**ket**ama**	em**ê ne**ket**ana**
kesê diduyan	t**ê (tuyê) ne**ket**ayî**	win**ê ne**ket**ana**
kesê sisyan ew	ew**ê ne**ket**a**	ew**ê ne**ket**ana**

Dema berê forma C

Forma eretî

	yekjimar	**pirjimar**
kesê pêşî	ez ket**ibim**	em ket**ibin**
kesê diduyan	tu ket**ibî**	win ket**ibin**
kesê sisyan ew	ew ket**ibe**	ew ket**ibin**

Forma neyînî

	yekjimar	**pirjimar**
kesê pêşî	ez **ne**ket**ibim**	em **ne**ket**ibin**
kesê diduyan	tu **ne**ket**ibî**	win **ne**ket**ibin**
kesê sisyan ew	ew **ne**ket**ibe**	ew **ne**ket**ibin**

KM
Lêkerê ”çûn” di hemû deman de di forma erêtî de veguhêzin!

Metelok
1. Aşvan ticaran nabe poşman.
2. Biharê pez, payizê rez, zivistanê ez.
3. Berê darê, darê dixemilêne.
4. Pêşî dest destan dişo, piştre serî û çavan dişo.
5. Pêşî gotina xwe bipêj, piştre birêj!
6. Bêhna dê ji xaltîkê tê.
7. Bêje rast, raze rast!
8. Bêhna kiz tê mala diz.

Veguhastina lêkerên hîmî yên derhingêv

Veguhastina lêkerên hêmiyî derhingêv di dema niha, ya werê û ya fermanî de wek veguhastina lêkerên saltgêr e. Nîşana kesan û cînavên kesînî jî wek hev in.
Emê wek nimûne lêkerê "dîtin" ji nav koma lêkerên hîmiyî derhingêv veguhêzin. Rayê dema buhurtî, ya ditinê "**dît**" e û yê dema niha "**bîn**" e.

1. Dema niha

Forma eretî

	yekjimar	**pirjimar**
kesê pêşî	ez **di**bîn**im**	em **di**bîn**in**
kesê diduyan	tu **di**bînî	win **di**bîn**in**
kesê sisyan ew	ew **di**bîn**e**	ew **di**bîn**in**

Forma neyînî

	yekjimar	**pirjimar**
kesê pêşî	ez **na**bîn**im**	em **na**bîn**in**
kesê diduyan	tu **na**bînî	win **na**bîn**in**
kesê sisyan ew	ew **na**bîn**e**	ew **na**bîn**in**

2. Dema werê

Forma eretî

	yekjimar	**pirjimar**
kesê pêşî	ez**ê bi**bîn**im**	em**ê bi**bîn**in**
kesê diduyan	t**ê** (tuyê**) bi**bînî	win**ê bi**bîn**in**
kesê sisyan ew	Ew**ê bi**bîn**e**	ew**ê bi**bîn**in**

Forma neyînî

	yekjimar	**pirjimar**
kesê pêşî	ez**ê ne**bîn**im**	em**ê ne**bîn**in**
kesê diduyan	t**ê** (tuyê**) ne**bînî	win**ê ne**bîn**in**
kesê sisyan ew	Ew**ê ne**bîn**e**	ew**ê ne**bîn**in**

Nasîn:
Çaxê têrker di hevokê de tê gotin, hingî ew di forma tewandî de tê bikaranîn, li vir têrker **dar** e, wek:

Ez darê dibînim.
Tu darê dibînî.
Ew darê dibîne.
Em darê dibînin.
Win darê dibînin.
Ew darê dibînin.

3. Forma fermanî

Forma eretî

	yekjimar	**pirjimar**
kesê diduyan	tu bibîn**e**!	win bibîn**in**!

Forma neyînî

	yekjimar	**pirjimar**
kesê diduyan	tu **ne**bîn**e**!	win **ne**bîn**in**!

Veguhastina lêkerên hîmî yê derhingêv di demên buhûrtî de.

Ew bi du awayan dibe:

A) Çaxê têrker di hevokê de nayê gotin
Çaxê têrker di hevokê de nayê gotin, lêker nayê veguhastin her wek rayê xwe dimêne, lê kirde tê tewandin, ew jî bi vî awayî:

4. Dema berê buhûrtî

Forma eretî

	yekjimar	**pirjimar**
kesê pêşî	**min** dît	**me** dît
kesê diduyan	**te** dît	**we** dît
kesê sisyan ew	**wê**, **wî** dît	**wan** dît

Forma neyînî

	yekjimar	**pirjimar**
kesê pêşî	**min ne**dît	**me ne**dît
